Folkpartiet på andra språk: **nordkurdiska**

Folkpartiet – Sveriges liberala parti [Partîya Gel – Partîya Lîberal ya Swêdê]

Partîya Gel yên Lîberal [Folkpartiet liberalerna] partîya lîberal ya Swêdê ye. Ji 2006an vir de em bi partîyên din yên di nava ”Hevpeymanîya ji bo Swêdê” [Allians för Sverige] re, di Hikumetê de cîh digrin. Nuha em jibo bawerîyek nûkirî ji we rica dikin – ji bo xatirê dibistanê û kar!

Pirsên me yên sereke ev in;

» **Dibistan.** Encamên zanînê ya dibistanên Swêdê de divê bê baştir kirin. Em dixwazin ku qarne dayîn hîn pêştir bê pêkanîn û her weha me kontrolên zanyarîyê yên zû pêk anîye ku bi saya wê xwendevanên ku hewcedarê alîkarîya ekstra ne di zûtirîn dema ku mimkin e wê alîkarîyê distînin. Desthilatdarîya mamosteyan ya pêkanîna nîzam û rêkûpêkî û hizûra xebatê divê xurttir bibe. Divê li dijî tadeya sîstematîkî [Mobbning] bi xurtî bê rawestandin.

» **Kar û bazirganî.** Divê karkirin û xwendin bi qezenc be. Me ji bona kesên bi kêmhatinî û bi hatînîya weset bac (vêrgî) bi nîsbeta mehê 1000 kron kêmtir kirîye. Em dixwazin kêmkirina baca ji hatinîyê bidomînin û şertên jib o bazirganan baêtir bikin. Em dixwazin her weha karên şagirdîyê pêk bînin da ku zêdetir ciwan gavên xwe bavêjin nav bazara kar.

» **Ewleyî.** Her kesên ku kar dikin divê ji alîyê sîgorteyek bêkarîyê ve bên parastin. Îroj rewş ne wisa ye. Her weha em dixwazin ewleyîya ji bo kalûpîran [îxtîyaran] baştir bikin û qanûnek derxin ku herçendî ji ber nexweşîya xwe yek ji wan mecbûr bimîne ku bar bike xanîyeke kalûpîran û li wir bijî, divê mafê wan hevjînên kalûpîr hebe ku bi hev re bimînin û bijîn. Têkoşîna li hemberî tawanên giran yên organîzekirî divê bê bilindkirin.

» **Entegrasyon.** Dema Sosyal Demokratan dev ji desthilatê berdan pirsa entegrasyonê wisa xerab dimeşîya ku berîya ku bîyanîyek nûhatî bikaribe kar bibîne, bi gelemperî/navincî heft sal wext derbas dibû. Em dizanin ku karkirin û zanîna zimanê swêdî kilîdên entegrasyonê ne û– Loma jî em mesrefên şîrketan kêmtir dikin da ku ew kesên nûhatî bistînin kar. Ji xebatên perwerdeya swêdî ji bo

Välkommen att kontakta oss om du vill veta mer eller bli medlem!
www.folkpartiet.se
info@liberal.se
020–53 53 53

Vill du hjälpa till i valkampanjen?
SMS:a VOLONTÄR till 72080
så kontaktar vi dig.
Kostar som ett vanligt SMS.

bîyanîyan re şertên zelaltir û mamosteyên baêtir perwerdebûyî tên amadekirin. Em dixwazên taxên ku xerab bûne ava bikin û li cîhên ku pêwîst bin hin beşên avahîyan hilweşînin.

» **Ewrûpa û dinya.** Em naxwazin li hemberî dinyayê bedenan ava bikin – em dixwazin derîyê jê re vekin. Ticareta serbest hem ji bo Swêdê hem jî ji bo welatên din baş e. Swêd divê bi tevahî bikeve nav YEyê – loma jî em ji Ewroyê re dibêjin erê. Penaxwaz, ji bo ku bikaribin ji taqîbatên li welatên xwe xelas bibin, divê xwedî maf bin ku li vir bimînin. Em, ew hedefa ku ji sedî yek a hilberîna nesafî ya Swêdê ji bona alîkarîya derve bê bikaranîn diparêzin. Ev pere divê ji bona têkoşîna li hember feqîrîyê (xizanîyê) û ji bo xurtkirina pêşveçûyîneka demokratîk bê bikaranîn. Rejîmên dîktatorî divê ji Swêdê nikaribin alîkarî bistînin.

» **Wekhevî.** Tevlihevîyên ji bo stendina bonusa (qezenca) wekhevîyê ya îzina dêûbavîtîyê divê bê kêmkirin – pereyên dêûbavîtîyê bêyî ku miraceat bê kirin divê yekser li hesaba meaşê bê razandin. Her weha bonusek nû ya wekhevîyê bê dayîn ku kesên ku dema zarok nexweş in, rojên ji bo lênêrîna zarokan [vård av barn] wekhev bi kar tînin re bê dayîn. Cezaya ji bo pêlêkirina hizûra jinan ya bi awayek giran divê bê zêdekirin. Mêrên ku cezaya qedexeya zîyaretê pêk naynin divê bi kelepçeya elektronîk ya li pîyan ve bên girêdan.

» **Hewa.** Guherandinên di hewayê de mezintirîn tehdîda li ser jîngehê ya bi serê xwe ya dema me ye. Em dixwazin enerjîya atomî ya xwe biparêzin û pêşve bibin ji bo ku bermayîyên bi koldîoksîd kêmtir bikin. Pêwîstî bi peymaneke hewayê ya navneteweyî û ya ku girê bide, heye. Pêwîst e ku avakirina enerjîya bayê û yên din ku dikarin bên nûkirinê bê pêşxistin û tesarufa enerjîyê zêde bibe.

Pirsên girin li pêşerojê ku li bendê ne

Ew krîza aborî ya navneteweyî bi awayeke giran tesîr li Swêdê kir. Lê bi saya tedbîrên ku ji alîyê Hikumeta Hevpeyman hatin stendin, Swêd xwe ji gelek welatên din baştir ji vê krîzê xelas kir.

Bi saya sîyaseteke malî ya biberpirsîyarî em dikarîbûn ku pêşveçûna aborîyê teşwîq bikin. Eger malîyeya (fînansên) dewletê baş nehatibaya rêvebirin, dê nuha ew daketina pêşveçûna aborî ya van salên dawî bi kêmkirinên refahê û bilindkirina bacê ve bi dawî hatibûya.

Şansên ji bona pêşveçûn û mezinbûna aborîyê di peryoda bê ya wezîfeya yasayî de baş in. Lê hêza biserxwevehatina me ya li hundir girêdayî wê polîtîkayêye ku em li welatê xwe dimeşînin. Tiştê tayînker ew e ku zêdetir kes kar bibînin. Kêmkirina baca (vêrgî) kar wisa kirîye ku karkirin zêdetir biqezenc e *[lönsam]* lê pêwîstî bi guherandinên gelek bacan û qaîdeyan heye.

Ji ciwanên ku dixwazin ji xwe re pîşeyek (meslekek) fêr bibin re divê îmkana karên şagirdîyê bên amadekirin.

Divê biqezenc be ku mirov ji xwe re xwendinek temam bike. Divê biqezenc be ku mirov rîsk bistîne û şîrketa xwe veke. Divê girtina kar hêsantir bibe. Swêd divê bibe ew welatê pêşeng ku karên lêkolînên zanistî û fikrên nû ji welatên din ber bi xwe ve bikşîne û teşwîq bike.

Welatê me girêdayî sanayîya ku ji alîyê enerjîyê ve întensîv e. Enerjîya atomî ya nû ku cîhê wan reaktorên ji ber kevinbûnê xebatê wan tên rawestandin, distîne, rê dide ku Swêd dikare elektrîka bê koldîoksîd ji bo sanayîya xwe ya bingehîn re bi dest bixe.

Ji bo ku karkirin û perwerde biqezenc be divê Swêd vegere ser ew qaîdeya ku jê re *"dema hatinî zêde bibe divê nîvê wê bimîne"* tê gotin – ango tu kes ji bo ew sed krona ku dawî qezenc dike divê ji sedî 50 zêdetir bac nede.

Kilîdên ji bo entegrasyoneke biserketî xwedîbûna kar û zanîna zimanê swêdî ne.

Pêwîst e ku perwerdeya swêdî ya ji bo bîyanîyan bê baştir kirin. Karê pêşî *[instegs-jobb]* û karê destpêkek nû *[nystartsjobb]* ji bo kesên nûhatî hêsantir dike ku bikevin nav bazara kar û kar bibînin.

Ji bo kesên ku karê xwe wenda dikin, hebûna sîgorteyeka bêkarîyê ku baş bixwebite, tayînker e. Sîgorteyek bêkarîyê ya giştî dê were pêkanîn.

Perwerdeyeka di dereceya dinyayê de

Dibistan aleta me ya herî baş e ku di jîyanê de ji hemû mirovan re eynî şansê bidin. Bi sîyasetek dibistanê ya rast, hemû xwendevan dikarin bibin xwedîyê şansa biserketinê.

Ji bona Partîya Gel ew destpêka nû ya ku ji bo dibistana swêdê tê bicîhanîn, vatinîyeka sereke ye. Divê ji sinifa şeşan pê ve qarne bê dayîn û perwerdeyeka nû ya mamosteyan bê destpêkirin. Îmtîhana neteweyî ya di sinifa sisêyan de divê bên nirxandin da ku ji bona xwendevanên ku nagihîjin armancên perwerdeyê, piştgirîyeka baştir bistînin. Dewlet divê berpirsîyarîya sereke (esasî) ya dibistanan bistîne ser xwe.

Yek ji bi awayeka baş a pêşwazîkirina globalîzmê zanyarîyên baş a zimanên bîyanî ye. Loma jî divê xwendevanên ku bi kêmanî du zimanên bîyanî di dibistana bingehîn de dixwînin vê yekê di dema miraceata lîseyê dikin divê bikaribin hesab bikin. Zimanê çînî divê li lîseyan bibe zimaneka nû ya bîyanî ku bê xwendin.

Hevkarîya di hemdema globalîzebûyînê de

Derîyên Swêdê yên li hember dinyayê divê vekirî bin – beden tune bin. Berîya her tiştî Swêd dikare bi rêya endametîya xwe ya li YEyê Swêd dikare tesîrê li pêşveçûyîna li dinyayê bike. Em dixwazin hevkarîya li Ewrûpayê kurtir bikin û Ewro divê mîna pere li Swêdê jî bê qebûlkirin û bikaranîn.

Herkes ji ticareta serbest qezenc dike. Bedenên gumrugê yên YEyê li hemberî welatên feqîr divê bên hilweşandin. Dinyaya dewlemend jî xwedîyê berpirsîyarîyeka exlaqîye ku piştgirî bide têkoşîna li hember feqîrîyê û ji bo demokrasîyê. Armanca ji sedî yek ya hatinîya ne safî ya neteweyî ji bo alîkarîya derve divê bê parastin û bicîhanîn

Em sîyaseteka comerd ya ji bo mafê penaberîyê diparêzin. Mafê penaberîyê mafeka mirovî ye. Mirovên ku ji tade û taqîbatê direvin xwedîyê maf in kul i Swêdê û li welatên din yên azad bên parastin.

Ewleyî

Pêwîst e ku ewleyî ya li hemberî tawanan bê xurtkirin. Me hejmara polîsan ji 17 000an derxistîye 20 000an.. Xebatên pêşîlêgirtinê û reaksîyonên bi lez, ji bo ku ciwan di kirinên krîmînalê de asê nebin bên sekinandin, pêwîstîyên bi taybetî ne.

Ne tiştekî exlaqîye ku li welateke refahê mirovên ku jîyaneka tevahî bi hev re jîyane, dema yek ji wan êdî nikaribe li mala xwe bijî, bên mecbûrkirin ku ji hev cuda bijîn. Qanûnek nû pêwîst e ku mafê hevjînên kalûpîr ya ji bo bi hev re bimînin -her weha di demên wan yên dawî dejî- biparêze.

Di qada psîkîyatrîyê de divê gavên nû bên domandin. Kesên ku miraceata alîkarîya acîl ya psîkîyatrîyê bikin divê yekser wê alîkarîyê bistînin. Tunebûna îmkanên bikaranînê ji bo kesên bi kêmfonksîyon divî mîna dîskrîmînasyon bê qebûlkirin û nirxandin.

Hêzên xwe ji bo wekhevîyê bidin hev

Wekhevî pirseke azadîyê ye. Em divê baldarîya xwe ya azadîya aborî ya ji bo jinan bidomînin. Divê li dijî karên qismî mesaî *[deltidsarbete]* bê rawestandin. Ji bo ku dêûbavîtîya bi wekhevî bê teşwîqkirin pêwîst e ku bonusa (dîyarîya) wekhevîyê bê hêsankirin û pêşxistin.

Ew şideta ku jin, bi tenê ku ew jin in rûbirû dibin, pirseke acîl ya wekhevîyê ye. Têkoşîna li dijî tawanên seksuel (cinsî) divê bê xurtkirin û divê zêdetir bal bikşînin ser tawanbaran.

Ji bo xatirê hewayê enerjîya atomî

Pirsa hewayê bi serê xwe mezintirîn pirsa global (kureyî) ya ku em rûbirû ne. Swêd û YE divê hewildanên xwe yên ji bo peymaneka global pêk were, bidomînin û her weha divê em ji bo armaceka bilindtir ya hewayê berîya herkesî cîh bigrin.

Reaktorên nû yên enerjîya atomî divê bên avakirin da ku ew cîhê yên kevin ku wexta xwe temem kirine, bistînin. Kombînasyona (girêdana) enerjîya nû ya atomî û hewildanên ji bo avakirina enerjîyên dikarin bên nûkirin rê vedike ku hilberîna Swêdê ya enerjîyê di pêşerojêde jî ji karbondîoksîdê azad bibe. Di xebata ji bo hewayê de xala merkezî ew e ku piralîbûna bîyolojîk bê parastin û xebata jîngehê yên din di behraê de jî neyê jibîrkirin.

Pêşvebirina wasiteyên (otomobîlên) bi elektrîk dê bermayîyên ji sektrora neqlîyatê bi awayeke xurt kêmtir bike. Dê prîma otomobîlên ji bo hewayê baş in bê pêkanîn.